

Beriya ku agir û şewat pêk bê, divê çî bê kirin:

AGAHDARIYAN BI DEST BIXIN,

Hûnê bi çî awayî bikaribin ji xanî an jî cihên ku hûn lê ne, ji nerdîwanan, hewş û sivderan, xwe bigihînin deriyên an jî cihên derketinê yê lezgîn!

têlefona nêzîktir, alarma agahdariya agirkujiyê û ya xaniyê li ku ne!

têlefona agahdariyê ya lezgîn bi çî awayî tê bi kar anîn!

aletên agirkujiyê û yê wek wan li ku ne û bi çî awayî tên bi kar anîn!

BALKÊŞ BIBIN,

ku hemû riyên rev û xelasiyê serbest in! Hewş û nerdîwan riyên rev û xelasiyê ne! Divê tu tişt di wan deran de neyên bicîh kirin. Ew ne cihên tişt bicîh kirinê ne!

deriyên cihên rev û xelasiyê divê her dem girtî bimînin, da ku agir û dûman gurtir û geştir û belav nebe!

cihê ketina xanî û awahiyên divê her dem serbest bimînin, erebe li wan deran divê neyên park kirin û her weha dest nedin kaniyên agirkujiyan!

da ku aletên ewlehiyê û yê agirkujiyê xirab nebin an jî bikaribin bê bi kar anîn!

BALKEŞÎ LI SER BIKARANÎNA AGIR AN ELEKTRÎKÊ!

Ji bo cixarekêşan her dem xwehdank hene, tiştên ku bikarin bişewitin wek qutiya qirş û qal û çopê tu car bikar neyên; li cihên qedexeya cixarê balkêş bibin!

Agir û çavkaniyên kel û germ tu car bê çavderî nehêlin! Ûtî, aletên germkirinê û aletên elektrîkî hwd. çavkaniyên kel û germ yê bihêztir in û wek agir xeternak in.

Aletên elektrîkî tu car nexumînin!

Aletên elektrîkî yê xirabe an jî ne wek adetî hatine tamîr kirin, her weha kabloyên elektrîkî, agir û xeterên elektrîkî bi xwe re tînin û divê tucar neyên bi kar anîn!

Kabloyên qetkirî an jî prîzên elektrîkê ku yê zêdetir ceryan lê bar kirî dikarin pir germ bibin û bibin sedema agir û şewatê!

Ger agir û şewat pêk were divê çî bê kirin:

ARAM Û SAKÎN BIBIN

û teqez û yeqîn nekevin nav panîkê! Kî cara ewil bikeve nav panîkê, tu car nikare bê xeter ji nav rewşeke xeternak derve!

BIBIN CIHÊN EWLE

û cîranan agahdar bikin!

Bi taybetî bala xwe bidin wan kesan, ku hewceyî alîkariyê ne. Divê berê alîkariya zarok û kesên hewcedariya alîkariyê ne bê kirin, ji ber ku ew nikarin xwe bi serê ji xeterê xilas bikin!

Ger mumkin be, penceran bigrin!

Teqez û yeqîn deriyên bigrin, da ku bikaribe belavbûn û xetera agir û dûmanê kêmtir bibel!

Bileztir mal an jî xaniyê terk bikin!

Ji ber xetera xeniqînê tu car asansoran (hilanokan) bi kar neyên. Ger elektrîk bê birîne, asansor jî wê asê bimîne!

Hemû şênîyên xaniyê li ber deriyê avahiyê berhev bibin û li benda agirkujan bimînin!

Xwe ji bo pirsên agirkujan an jî polîsan amade bikin!

GER RIYÊN REVÊ DI BIN DÛMANÊ DE BE

ber bi ciheke ne di bin dûmanê de ye vekîşin,
derî bigrin û xwe bi cil, kinc an jî betaniyan baş
bipêçin!

Ji pencereyên vekirî banga alîkariyê bikin!

Tu car bi çavkorî ji penceran banz nedin!

SAZIYA AGIRKUJIYÊ AGAHDAR BIKIN

li ser reqema têlefona 112!

Navê xwe bêjin,

çî bû û çî qewimî,

li ku çê bû û qewimî,

çend kes di nav xeter û talûkê de ne.

Bersîva pirsên din bidin!

Têlefônê negrin! Li bendê bin heta ku navend
axaftinê biqedîne!

HEWL BIDIN AGIR Û ŞEWATÊN PIÇÛK BI XWE VEMIRÎNIN

lê belê tu car xwe di nav xeteriyê de nehêlin!
Dûman jî wekî agir xeternak e, lê pir bi leztir e!

BALKÊŞIYEKE DIN:

Di her pirsgirêkên parastina ji agir û
şewatê de, Saziya Agirkujiya Herêmi
bi kêfxeşî alîkariya we dike.

Stempel
der Feuerwehr



**Saziya
Agirkujiyê
we agahdar
dike...**